

N. Eskender Ceiferî

## Faşîzma Îranê li dijî hevpeymaniya Kurdistanî ye

Di rojên ku hêrsa raya giştî li seranserê Îranê li ser zext, cudakarî û polîtîkayên navendî zêde dibe, nûçeya avakirina “hevpeymanya hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê” ji hêla şeş hêzên serekeyên Kurdî ve sînorên faşîzma Îranê şikand.

Dom»R:6






N. Bayram Bozyel

## Serdema kevneperest ya li Îranê ber bi dawî ve diçe

Rejîma melayan ya paşverû a Îranê bi salan e, ji bilî zilm û darvekirinê tiştek pêşkêşî gelê xwe nekiriye. Bi deh hezaran ciwan, jin, mêr û muxalifên Kurd bi awayekî hovane darve kiriye. Bi deste hêzên milîsên perwerdekirî û çekdar welatên herêmê terorize kirîye. Çavkaniyên welatê xwe ji bo bêîstîqrarkirina herêmê û pêşxistina çekên nukleerî xerc kiriye. Rejîma teokratîk a Îranê ji ber gendeliyê û rizandina exlaqî û siyasî, demek dirêj e ku rewatiya xwe winda kiriye.

Dom» R:6

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (513) 10-03-2026




N. Dr. Mecîd Heqî

## Têhran Di Bin Kavilan De

Dîrok carinan bi gavên hêdî dimeşe, lê carinan jî di nav çend mehan de wekî tsunamiyekê hemû tiştî radimalîne. Ew tiştê ku di navbera Kanûna 2025 û Sibata 2026an de li ser axa Îranê qewimî, ne tenê “guhertina rejîmê” bû; ew herifîna felsefeya dewlet-neteweya navendparêz û teokratîk bû ku nêzîkî sedsalê ye (ji dema Pehlewiyan heta mîrateya Xumeynî) gelên vê cografyayê di bin tirs û zextê de girtibûn.

Dom» R:9

# Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê hate ragihandin



### Mistefa Hicrî: Padiganan bi cih bihêlin û vegerne nav malbatên xwe

Rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê rû bi serbaz û personelên binkeyên ewlehî û serbaziyên rêjîmê, peyamek belav kir.

**Deqa peyamê wihaye:**

Êrîşên Amerîka û Îsraîl bo ser binkeyên ewlehî û serbaziyên rêjîma komara îslamiya Îranê, gelek caran dibe gef bi ser jiyana xelkê medenî û asayî.Ez daxwazê ji hemû serbaz û personelên xwdî helwîst û azadîxwaz li seranserê Îranê û bi taybet li Kurdistanê dikim ku padigan û binkeyên ewlehî yên spaha pasdaran, artêş û hêzên çekdarên rêjîmê bi cih bihêlin û dest ji xizmet û erkê pêspartî yên rêjîmê berdin û vegerine nav malbatên xwe.Ev yeka jî li pêxema parastîbûna wan ji wan êrîşane ye û piştre, piştkirina wan li hêzên çekdar û tepeserkerên rêjîmê ye.

Mistefa Hicrî

**Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**4ê Şibata 2026**




Pênc partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê li kombûnekê de hevpeymaniya hêzên siyasî yên Kurdistana Îranê ragihandin.

Roja Yekşemî 22ê Şibatê, Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, Partiya Azadî a Kurdistanê, Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê, Sazimana Xebat a Kurdistana Îranê û Komeleya Zehmetkêşan a Kurdistanê, Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê wajo kirin.

Li vê kombûnê de, rêzdar Mistefa Hicrî, Sikirtêrê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, got ku avakirina “hevpeymaniya hêzên siyasî yên Kurdistana Îranê hewcehiyek girîng a têkoşîna me li Rojhilatê Kurdistanê bû.

Ev hevpeymanî berhema çend heyv ji danûstandinan ji bo têgihîştin ji hevdu û hevkariya zêdetir li ser bingeha platformek hevpar bû û bi ragihandina hevpeymaniyê jî, qonaxek nû li têkoşîna hevpar a van hêzên siyasî dest pê dike.

Sikirtêrê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê li axaftina xwe de got ku avakirina vê hevpeymaniyê hewldanek bi kiryar bo yekîtî û yekrêziya li pêxema peydakirina derfetan û nehiştina gef û metirsiyên li Rojhilatê Kurdistanê û bo vê ye ku li guherînên siyasî yên Îran û Kurdistanê de me rol û bandora jêhatiye xwe hebe.

rêzdar Mistefa Hicrî tekez kir ku ev hevpeymanî li dijî ti aliyek din a siyasî nîne û berevajî vê, em hêvî dikin ku ev hevpeymanî heta bikare, berfirehtir be û hêz û partiyên din ên siyasî, xwe li nav de bibînin.

Rêzdar Husêyn Yezdanpenah serokê Partiya Azadî a Kurdistanê, Xatûn Peyman Viyan Hevseroka Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê, rêzdar Babaşêx Husêynî Sikirtêrê Giştî yê Sazimana Xebat a Kurdistanê û rêzdar Reza Keibî Sikirtêrê Giştî yê Komeleya Zehmetkêşan a Kurdistanê li axaftinên xwe de tekezî li ser hewcehiya hevxebatî, yêkrêzî û berfirehkirina “Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê” kirin.

Li vê civînê de, du belgenameyên “Platforma Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê” û “Daxuyaniya Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê” ji aliyê berpirsên yekem ên Hizbên beşdar li vê hevpeymaniyê de hate wajokirin.

**Deqa daxuyaniya vê hevpeymaniyê li vê lînkê de bixwînin: “Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê”**



## Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê: Rojên herî çarenûssaz li pêşiya me ne

Dom » R:4



## Daxuyaniya ragihandinî a hevpeymaniya hêzên siyasî yên Kurdistana Îranê

Dom » R:2

# Daxuyaniya ragihandinî a hevpeymaniya hêzên siyasî yên Kurdistana Îranê

**Xelkê xebatkarê Kurdistanê!**

**Hizb û aliyên siyasî yên Kurdistanî û Îranî!**

**Azadîxwaz û xebatkarên seranserî welat!**

Tevgera siyasî û netewî ya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê dehan sal e bi şêwaza rêkxistinkirî û bi berdewam bi dijî serberedayî û desthilata dîktatoriya navendgira de li pêxema mafên netewî û siyasî yên xwe de xebatê dike.

Piştî şoreşa sala 1357 a rojî û hatineserkar a komra îslamî jî Kurdistan her çeper û navenda bingehîn a xebat û berxwedana bi dijî vê rêjîma tepeserker bûye. Kurdistanê li vî heyamî de gelek nirxên giran bo xebat û xweragiriya xwe dane.

Şerê bi serdesepandî, dehan rêberên siyasî hatine bidarvekirin û terorkirinê, hezaran xortên xebatkar û çalakvanên siyasî şehîd bûne û li girtîgehan de canê xwe ji dest dane, Kurdistan jî wek cografiyayek dagîrkirî hatiye milîtarîzekirin û bi siyaseta tepeserkirin, talankirin û birinê, ji aliyê hikûmeta komara îslamî ve hatiye birêvebirin.

Em ev Hizbên siyasî yên ku “Hevpeymaniya Hêzên Siyasî ya Kurdistana Îranê” wajo kiriye, bi piştgirêdan bi dîroka xebat û tekoşîna xwe û bi balkêşandina bi ser hewcehiyên bersivdan û xwetêdedîtin li rewşa siyasî a niha ya Îranê de ku rêjîma komara îslamî ti rewatiyek siyasî bo nemaye, lê mixabin bi sedema nebûna yekîtiya hêzên siyasî yên dijber, heta niha jî sekiniye, li Kurdistanê de me hêz û refên xebata xwe kirine yek û hevpeymaniyek siyasî ragihandî ye.

Armanca bingehîn a vê hevpeymaniyê ku piştî qonaxa vegihastina hizr û ra û karên meydanî li “Navenda Diyalog bo Hevkarî”yê de pêk hatiye, yekîtî û hevxebatiya zêdetir bo giringîdana zêdetir bi tevgera siyasî ya Kurd li Îranê û dana giranî û rola zêdetir a Kurdistanê û tevgera siyasiya vê li xebat bi dijî komara îslamî, bidestveanîna maf û azadiyên xelkê Kurdistanê û çawaniya dariştina Îrana Paşerojê ye.

Armanca bingehîn û hevpare me li vê hevpeymaniyê de, xebat bo herifandina komara îslamîya Îranê, bidestveanîna mafê diyarîkirina çarenûsa Kurd û avakirina sitatoyeke niştimanî û dêmokratîk li ser bingeha îradeya siyasî ya netewa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ye.

Em bi piştevanîkirin li xebat û nerizayetiya seranserî ya netewên Îranê bi dijî komara îslamî, li vê qonaxê de pêdegirî bi ser hewcehiya hevahengî û hevxebatiya siyasî û meydanî ya li navbera Hizbên siyasî û rêkxiravên medenî yên beşên din ên Îranê dikin.

Em tevî piştevanîkirin li pêkhatina qonaxeke vegihastina dêmokratîk û giştgîr, bingeh û mercê heçî hevkarî û hevpeymaniyeke me digel aliyên din, dê bifermînaskirina mafê neteweyî yê netewan, erêkirina dêmokrasî û redkirina her cure dîktatoriyekê ye.




Me li vê hevpeymaniyê de bawerî bi parastina jîngeh û dadperweriya civakî, mafên vekhev ên jin û mêr, erêkirina hilbijartina azad, dabînbûn û bidestveanîna mafên bingehîn ên hemû pêkhateyên netewî û olên Kurdistanê û bi avakirina sîstema birêveberî û dêmokratîk li Rojhilatê Kurdistanê de heye.

Hevdem digel hewldan bo avakirina sîstemeke siyasî ya dêmokratîk û sikolar li Îranê ku mafên pêkhateyên netewî û olên cur bi cur ên vî welatî dabîn bike, em bi erkê xwe dizanin.

Baweriya me ev e ku niha zêdetir ji herdemekê, yekîtiya siyasî û hevgotariya aliyên siyasî û tekoşîna hevpar a meydanî, şertê bihêzkirina pêgeha Kurd li hevkêşên siyasî yên berdewam guherên Îranê ye.

Lewma digel hemû Hizb û aliyên siyasî yên derveyî hevpeymaniya xwe, em amadeyê hevkarîkirinê ne û em xelkê Kurdistanê jî bo xwedîtin li vê hevpeymaniyê de gazî dikin.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**
**22ê Şibata 2026**

**Endamên Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê ev in**

- **Partiya Azadî a Kurdistanê**
- **Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê**
- **Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
- **Sazimana Xebat a Kurdistana Îranê**
- **Komeleya Zehmetkêşan a Kurdistanê**

# Xalid Ezîzî: Ji bo cihgîrkirina demokrasiyê li Îranê de em bi hemû aliyên re di diyalogê de ne

Xalid Ezîzî, Berdevkê Hizba Demokrat a Kurdistan a Îranê di hevpeyvînek nû digel “Radiyo Ferda” re ragihand ku Hizba wî ji nêz ve çavdêriya guhertinên herêmê û şerê niha dike. Lê wî bal kişand ser vê yekê ku pêşîniya wan karê siyasî, yekdengiya neteweyî û amadekariya ji bo qonaxa veguhastinê ye.

Ezîzî di bersiva pirsa li ser gotinên”Tiramp” û helwesta Waşingtonê de, amaje bu vê yekê kir ku Hizba Demokrat her dem ji bo gihandina dengê gelê Kurdistanê bi sazî û dezgehên cûda yên Amerîka û Ewropayê re di pêwendiyê de bûye.
Navbirî got: Têkoşîna me têkoşînek medenî û cemawerî ye, û em dixwazin bi rêya diyaloga siyasî mafên gelê Kurd di çarçoveya Îranek demokratîk û federal de bi dest bînin.
Li derheq pêwendiya wan bi opozîsyona Îranî re jî, Ezîzî bal kişande ser girîngiya afirandina alternatîfek demokratîk ku hemû netewe û pêkhateyên cûda tê de beşdar bin.
Herwisa Xalid Ezîzî nîgeraniyên pêwendîdar bi parçebûna Îranê red kir û ragihand ku projeya Hizba Demokrat a Kurdistan a Îranê û hevpeymaniya aliyên siyasî yên Kurd li ser bingeha parvekirina dadperwer a desthilatê û nemerkezîbûnê hatiye avakirin, ne li ser bingeha parçe parçe kirinê.




Berdevkê Hizba Demokrat, herwisa amaje bi vê kir ku ew piştevanê aştî û aramiya herêmê ne û naxwazin alozî herî zêde bibin. Lê belê hewldanên wan ew in ku di egera valatiya desthilatê de, birêya hêzên demokratîk amade bin ku welat birêve bibin û berjewendiyên neteweyî yên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê biparêzin.

# Daxuyaniya “Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê” li bersiva gefên Riza Pehlewî bi dijî netewa Kurd




**Civatên mafxwaze Kurdiustanê!**

**Xelkê azadîxwaze Îranê!**

Piştî belavbûna nûçeya ragihandina “Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê” pêleke keyfxweşî û dilgermiya şoreşgêrane a xelkê Kurdistanê, netewên bindest û azadîxwaz ên Îranê li xwe girt. Ragihandina vê heypeymaniyê, dengvedaneke berfireh di nava hêzên siyasî yên xebatkare Îranê û navendên siyasiy ên navnetewî de jî hebûye.

Li hember de rêjîma îslamiya Îranê û herwisa taqimek ji dijberên mafên netewî yên netewên bindest û azadiyên dêmokratîk ku xwe li jêr qalkê opozîsiyonê de veşartine, bi awayê dîn û har bertek nîşandane û kînaa xwe rijandine, ku me ev çavnihêriya vê yêkê jî dikir.

Her li berdewamiya vê berteknîşandanê de roja Çarşemî 25ê Şibatê, Riza Pehlewî bi belavkirina postekê li tora civakiya “X”, ev jî bi peyvên zivr û tohmetlêdanên bê esas ên hertimî, netewa mezine Kurd û Hizbên siyasî yên xebatkar ên Kurdistanê dane ber tan û teşeran.

Navbirî tevî bilindkirina kopalê riziye cudaxwaziyê, gefxwariye ku piştî herifîna rêjîma Îslamî, dê sipahê bo tepeserkirina tevgera mafxwazaneye netewa kurd, erkdar bike.

Mirov dibêje her ji bîra Riza Pehlewî çoye ku her demek îradeya rastîn bo perçekirina Îranê hebe, kesê îznê ji bav û bapîrê tacdarên wî wernegirtiye wan jî xema xaka Îranê nexwarine û qusûrî nekirine , her wek pêşkêşkirina Ararata Biçûk, radestkirina Behrên û çavkaniyên çemê Hîrmendê, li firotin an radestkirina beşên cuda yên axa Îranê xwe neparastine, ev hertim li guherîna dîrokê de bi teqandina fîşengekê û heta bi îşaretek biçûk ya aliyên biyanî, yan revîne û jev belav bûne, yan kunemişk bo wan bûne qeyserî.

Li rastiyê de take cihek ku wan karîne xwe têde bidin nîşandan, meydana komkujkirina xelkê medenî û tepeserkirina daxwzaiyên dêmokratîk ên xelkê Îranê, bi taybet netewên bindest ên wî welatî bûye.

Gefxwarinên berdewam ên navbirî bo bikaranîna sipahê bi armanca rawestan li hember daxwaziyên siyasiye netewên Îranê, perdê li ser vê rastiyê hil dide ku li Îrana paşerojê ya li xeyala wî de, şêwaza reftarkirin digel daxwaziyên medenî û daxwaziyên dêmokratîk ên ku li carnameya mafên mirovî ya Saziya Netewên Yekgirtî de, dê her bi ewlehî û serbazî bimîne û ti cudatiyek bingehîn li navbera rêjîma siyasiya li xeyala wî de û rêjîmên tepeserkere pêşda û ya nihaya Îranê de nabe. Tevî vê yekê jî, gelo çima wa hizir dike ku xelkê bêzarbûyî ji dîktatoriya rêjîma îslamî amade ne serê xwe bo wî û hevhizrên wî bitewînin û wan parek ji altirnatîva bo Îrana pêşerojê qebûl bikin?

Ji aliyê din ve, xuya ye navbirî tevî nebûna zanyarî ji dîrok û cografiyayê, têgihîştineke serast ji dema niha nîne. Neku dibe bizaniya ku sipah û hemû alavên tepeserkirina hikûmî û her ev sipaha pasdaran a terorîstî ye ku wî şanazî pê kiriye û piştevanê wê bûye, li sedsala derbasbûyî de ti demekê li Kurdistanê dûr nebûye û nîne, Herwisa ti mikanîzmek bo tepeserkirinê nemaye ku li ser Kurdistanê nehatibe ceribandin û rastî şikestê nehatibe, heta ku navbirî bixwaze piştî tacdanînia wehmî û xeyaliya xwe, li wî warî de tiştekî nû biafirîne û nîşan bide.

Xencer ji kalankêşana Riza Pehlewî bi dijî tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd li demekê de ye ku bi şahidiya hemû azadîxwazan û şarezayên karûbarên Îranê, li tevgera “Jîna”(Jin Jiyan Azadî) yê û herwisa li serhildana vê dawiyê ya xelkê Îranê, navbirî bi hevkariya taqimeke cihê şik û gumana derdora xwe, roleke eşkere li çêkirina netifaqî û jevweqetandina refên gel û dijberên rêjîmê hebûye.

Kite aliyeke siyasî ku li vî heyamî de li peymana biratiyê digel de maye û hevxemiyê bo dide nîşandan, her ev hêzên çekdar û ewlehî û tepeserker ên terorîstî yên rêjîma îslamî bûne, Heta vê astê ku li nûtirîn axaftinên xwe de bo veşartina rola wan li tawankarî û karesata bi sam a heyva Befranbarê, îdia dike ku hêzên çekdar ti rolek li wan tepeserkirinan de nebûne û tevaviya wan tawankariyan, bi rêye destek biyanî bûye! Herwisa li demekê de dost û dujmin şahidiyê bo vê yekê didin ku netewa Kurd û Hizbên siyasî yên xebatkarên Kurdistanê bi dirêjahiya temenê sitemkarane a komara îslamî, hertim kelemê nav çavên serberedayîya rêjîma xumêynî de bûye, û hertim penageh û piştevanê rastîn a xebatkarên netewên Îranê bûye û bi rêya xebata dijî vê rêjîma tepeserker de, nirxên gelek giran dane, Ku çi niha yêkî wekî Pehlewî, hizbên Kurdî bi hevkarî digel xumêynî tohmetbar dike ev tohmetane jî li demekê deye ku her vê serdemê, bi fitwaya cîhada xumêynî Kurdistan ji erd û esmanve, kiribûn armanca êrîşên bi xwîn, Riza Pehlewî her bi xwe çendîn caran gotiye ku name bo xumêynî nivîsandiye û daxwaz kiriye ku wek firokevanek asayî li nav hêzên rêjîmê de bê vergitin!

Cihê heyrîmanê ye ku kesek bi vê derbasbûya xwe ya tejî serşoriyê, Hizbên Kurdistanê bi hevkarî digel xumêynî û bîhaniyan tohmetbar dike, Li halekê de xwe bi sozdana çewt bi xelkê serîhildayî li navxweyê Îranê li derheq hebûna hezaran kes ji hêzên reviyayî ji nav hêzên tepeserkar, hebûna sedan hezar alavên “Star Link” û nebûna ti îmkanek li qutbûna înternetê û gihîştina alîkariya derve, bû sedem ku hezaran kes ji azadîxwazên me bêne ser şeqaman û bikevne nav dafka rêjîma tawankar a komara îslam. Bê guman, piştî azadbûna Îranê û piştî dadgehîkirina berpirsên îxanetkar ên hikûmî û bikujan û tawankarên rêjîmê, navbirî jî dibe li hember wan cure şaşiyên îxanetkaraneyên xwe de bersivder be.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê tevî şermezarkirina wan cure axaftinên sivik û pûçe Riza Pehlewî, tekezî li ser helwîstên bingehîne xwe li parastina armancên netewa Kurd û mafên rewaye netewên bindest ên Îranê dike û li ser vê baweriyê ye ku ev cure kîndarî û axaftinên dujminkarane li dawiyê de nagihîje ti encamekê, belku îradeya netewên azadîxwaz û têkoşerên Îranê li xebat û cehd bo bidestveanîna armancên azadîxwazneya xelkê serhildayî û binaxkirina hertimiya dîktatorî û faşîzmê li her cur û rengekê be, qahîmtir dike.

Lewma careke din jî em daxwazê ji hemû hêzên Kurdistanê ku daxwaziya azadî û berevanîkirin li mafên netewiyên xwe dikin, bo rawestan li hember gotarên qurixkarane û tevaviyetxwaz, tevlî refa “Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê” bin.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**

**25ê Şibata 2026**

# Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê: Rojên herî çarenûssaz li pêşiya me ne

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê: Rojên herî çarenûssaz li pêşiya me ne**

**Daxuyaniya Hejmar 1**

**Xelkê Xebatkar û mafxwaz ê Kurdistanê!**

Ji roja şemî 9ê reşemê ve pêvajoya bûyerên li Îranê ber bi guherînên kûr û bingehîn ve diçin. Ev şerê ku niha qewimî ye, encama dehan salî siyaseta zêdexwaziya rêjîmê, destêverdan li karûbarên welatên deverê, piştevanîkirin li terorîzma dewletî, pêdegirî li ser bidestxistina bomba navikî û pêşxistina pîşeyî ya mûşekî, û gefa wê li ser ewlehiya cîhanî û guhnedan bi yasayên navnetewî ye; Siyasetek ku cara dawî hem Îran kire welatekî kawil bi aboriyeka îflaskirî û hem rêjîma xwe jî ber bi herifînê ve bir.

Kuştina Xamineyî rêberê rêjîmê û dehan fermandeyên serbazî û karbidestên siyasî yên rêjîmê jî domînoya herifînê lezgîntir kiriye.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê radigehîne ku ev şer, şerê civaka Îranê û neteweyên vî welatî digel Amerîka û Îsraîlê û civaka cîhanî nîne, belku eva rêjîma dîktator û tepeserker a komara îslamî ye ku hemû xelkê welat bi barimte girtiye, û hemû maf û azadiyek jê zewt kiriye û her li heyva befranbara îsal bi hezaran kesî ji xelkê serhildayî û mafxwaz ê Îranê komkuj kir.

Niha jî ku Îran û Rojhilatê Kurdistanê li ber qedersaztirîn rojên xwe de ye, rû li civaka Kurdistanê, em wan daxwaziyan dikin:

**1-** Xelkê Kurdistanê li gor pêvajoya bûyeran, hewce ye ku hişyar bin û bi hişarî rûberûyê pêşhatan bibin û reftara siyasî ya xwe digel daxwaz û pêspartiyên Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistanana Îranê rêk bixin û vê hevahengî û pêwendiyê zindî û berhemdar bikin.

**2-** Di rojên şikestxwarina rêjîmê û serhildana giştî ya xelkê de hewce ye hemû binke û demûdezgehên îdarî û xizmetguzariyê li pêxema berjewendî û hewcehiyên giştî de bêne parastin.

**3-** Em daxwazê ji hêzên çekdar ên rêjîmê li Kurdistanê dikin ku refa xwe ji paşmayiyên Komara Îslamî cuda bikin. Em bi wan radigehînin ku wiha baş e ku vê derfetê bo piştkirin li dijmin û hilbijartina bereya neteweya xwe ji dest nedin.

**4-**Hewce ye ku hemû xelkê Kurdistanê bi hişmendî û têgihîştin ve rûberûyê




guherînkariyan bibin û xwe ji gefxwarin û tolhildana takekesî ku xisarê digihîne ewlehî û parastina giştî ya civakê, xwe biparêzin.

**5-** Em daxwaz dikin ku li pêxema parastîbûna zêdetir her çiqas ku bikarin, ji binke û navendên serbazî yên rêjîmê dûr bikevin.

Em daxwaz dikin ku li rojên dijwar ên li pêşiya me de xelkê me bi taybet qata bazarî û dikandar û xwdiyên malan, ji her demekê zêdetir hay li hevdu bi taybet xelkê kirêçî, hejar û desteng bin û bi destgirtina hevdu, wan rojên dijwar derbas bikin.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê digel pêvajoya bûyeran dê siyaset û bernameyên xwe bi rêya daxuyaniyên xwe ên din dê belav bike.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**
**11.12.1404**
**02.03.2026**

# Êrîşên rêjîmê nikarin pêngawên xebat û berdewamiya me bisekinîne




**Xelkê xebatkar û têkoşerê Kurdistanê!**

Li çend rojên derbasbûyî de komara îslamiya Îranê bi berdewamî bi mûşek û dironan, binkeyên hêzên siyasî yên Kurdistanê dike armanc.

Wan êrîşan, şehîdbûna "Celal Reşîdî" pêşmergeyê Partiya Azadî a Kurdistanê û birîndarbûna çend pêşmergeyên din ên vê Hizbê û Hizba Dêîmokrat û Komeleya Şêreşgêr a Zehmetkêşan a Kurdistsna Îranê li pey xwe aniye.

Li çend rojên derbasbûyî de li navxweyê Kurdistanê de jî û li çend bajarên din, bi sedema bombebarankirinan hejmarek kesên medenî şehîd û birîndar bûne.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê tevî sersaxîdan bi malbata Şehîd "Celal Reşîdî" û Partiya Azadî a Kurdistanê û herwisa malbata qurbaniyên vê şerê ku komara îslamî li deverê de dest pêkiriye, radigehînin.

Êrîşên rêjîmê bo ser binke û bargehên Hizbên Siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê ku nîşaneya neşiyan û tirsa mezin a karbidestên rêjîmê li tevgera mafxwazane ya Kurd li Îranê, ne tenê pêngawên xebat û berdewambûna me nikare bisekinîne, belku îradeya me bo, xebat û li pêxema herifandina komara îslamî û rizgariya Kurdistanê bihêztir dike.

Herwisa careke din em daxwazê ji xelkê Kurdistanê dikin ku li demekê de rêjîm hêzên xwe li mizgevt û qutabxaneyan de cihgîr kirine û kombûnên serbazî û ewlehî li navendên îdarî de bi rê ve dibe, hewce ye bi lezgînî ji binkeyên serbazî û navendên ewlehî û îdareyên rêjîmê û herwisa li cihê kombûna hêzên wan dûr bikevin.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**
**3ê Adara 2026**

# Rêzdar Mistefa Hicrî, bi hilkefta 8 Mars, peyamek belav kir



Rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta 8 Mars roja cêhaniya Jinan, peyamek belav kir.

**Deqa peyamê wiha ye:**

Felsefeya 8ê Mars, îşare bi vê rastiyê ye ku azadî bê bidestveanîna mafên jinan, ti îmkanek nîne. Dîroka xebat bo vekhevî û azadiyê dide selimandin ku her guherînekê de jin beşdar nebin, encama vê dibe sitemkarî û binpêkirina mafên civakî, aborî û siyasî. Bi vê sedemê ye ku vekhevîxwazî dibe mercek bingehîn bo her cure dêmokrasî û rizgariyek netewî, li paşerojê de.
Îro li Kurdistan û Îranê, xebata jinan çeq an navenda vê geuherîna dîrokî ye ku binyatên rêjîma kevneperest a komara îslamî hejandiye. Hewce ye ev hişariya siyasî wek sermayeyek mezin, wek hêzeke rêkxistinkirî û hêvinê guherîna binyatî bê bikaranîn da ku civakê rû bi qonaxeke dêmokratîk ve bibe. Hebûna hişariya bi kom û ceribandina tekoşîn û xebata jinên pêşeng ên Kurdistanê, sibêdehek geş bo paşeroja netewa me wêne dike.
Tevî pirozbahîkirina vê hilkefta cîhanî li hemû jinên Kurdistan û Îranê, em piştevanîkirina xwe li mafên jinan û çêkirina derfet û ekosîstemek bi wec bo wekhevî û dadperweriya civakî, dubare dikin.

**Mistefa Hicrî**
**Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**8ê Adarê beranber bi 8ê March 2026**

# Mistefa Hicrî: Ziman sitûna nasnameya me a neyewî ye

**Rêzdar Mistefa Hicrî, Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta 21ê Şibatê, Roja Cîhanî a Zimanê Dayîkê, peyamek belav kir.**

**Deq peyamê wiha ye:**
Li Roja Cîhanî a Zimanê Dayîkê de ez silavek germ dişînim bo hemû têkoşerên ku li pêxema parastin û geşeya zimanê Kurdî de xebatê dikin.
Bo me Kurdan, ziman bi tenê alava axaftinê nîne, belku sitûna nasnameya me a neteweyî ye û kela berevanî û parastina ji hebûna civakî û siyasiya me ye.
Bo mirovahiyê cihê şermê ye ku li vê serdemê de hêj zarokên Kurd û netewên ne-Fars ên Îranê, ji destpêkîtirîn mafên sirûştiye xwe ku perwerde û hînkarî bi zimanê dayîkê ye, hatine bêparkirin.
Ev siyaseta sîstematîk bo jinavbirîna nasnameya netewî û asimîlasiyona kultûrên cuda ye û hewce ye civaka navnetewî li hember vê siyasetê, bêdeng nebe.
Îsal, bi bîranîna vê yadê hevdem digel birînên kûr ên heyva derbasbûyî ya Kirmaşan, Îlam û Luristana qehreman e. ev parêzgahane li xwenîşandanên vê dawiyê de bû ne meydana qurbanîdanê û hezaran xortên qehreman hatine şehîd û birîndarkirin. Vê xwîna paqîj a li wir rijyayî, da selimandin ku daxwaza azadî û parastina nasname, ji hev naqetin. Mangirtina seranserî ya gelê me ku li ser banghêjiya 7 hizbên Rojhilatê Kurdistanê bo piştevanîkirin li wan 3 parêzgehan bi rê ve ço, nîşaneya yekrêziya polayîn a netewa me bû.



Li vê bîranînê de em soza xwe nû dikin ku heta gihîştin bi mafên xwe yên netewî ku perwerde û hînkarî bi zimanê dayîkê yek ji wan e, dê li xebatkirinê berdewam bin.

**Mistefa Hicrî**
**Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**20ê Şibata 2026**

# Hevpeymaniya Hêzên siyasî yên Kurdistana Îranê daxuyaniyek belav kir




**Hevpeymaniya Hêzên siyasî yên Kurdistana Îranê li derheq biryara Deftera Siyasî ya Komeleya Şoreşgêr a Zehmetkêşan a Kurdistana Îranê bo tevlîbûn bi vê hevpeymaniyê daxuyaniyek belav kir**

**Deq peyamê wiha ye:**
**Civaka xebatkar û têkoşerên Kurdistanê!**

Deftera Siyasî ya Komeleya Şoreşgêra Zehmetkêşan a Kurdistana Îranê bi belavkirina daxuyaniyekê, biryar da ku ji îrovê ve beşdarê Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê bibe. Hevpeymaniya Hizbên Siyasî yên Kurdistana Îranê bi germî pêşewazî li vê biryara Deftera Siyasî ya Komeleya Şorşgêra Zehmetkêşan a Kurdistana Îranê dike û li ser vê baweriyê ye ku ev pêngaw girîng e, ev jî li vê qonaxa hestiyar de vekheviya zêdetir û tebayiyek qahîmtir a Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê li pey xwe tîne.
Em alxahîn in ku her çawa Komeleya Şoreşgêra Zehmetkêşan a Kurdistana Îranê li dariştina beş û xalên platforma erêkirî ya Hevpeymaniyê de rolek girîn hebûye, li berdewamiya xebata meydanî û bidestveanîna armancên vê hevpeymaniyê de jî rola xwe ya bi bandor hebe. Hêz li yekgirtin û vekheviyê de ye, bêguman ev yekgirtin û hevpeymaniya, me bi armancên me nêzîktir dike.

**Serbikeve tevgera rizgarîxwaziya gelê me**
**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**
**3ê Şibata 2026**

# Serdema kevneperest ya li Îranê ber bi dawî ve diçe



**N. Bayram Bozyel, Serokê Giştî yê Partîya Sosyalîst a Kurdistan (PSK)**



Rejîma melayan ya paşverû a Îranê bi salan e, ji bilî zilm û darvekirinê tiştek pêşkêşî gelê xwe nekiriye. Bi deh hezaran ciwan, jin, mêr û muxalifên Kurd bi awayekî hovane darve kiriye. Bi deste hêzên milîsên perwerdekirî û çekdar welatên herêmê terorize kirîye.

Çavkaniyên welatê xwe ji bo bêîstîqrarkirina herêmê û pêşxistina çekên nukleerî xerc kiriye. Rejîma teokratîk a Îranê ji ber gendeliyê û rizandina exlaqî û siyasî, demek dirêj e ku rewatiya xwe winda kiriye.

Rejîma otorîter û zordar a hovane ya Îranê, ku di çend salên dawî de li Xezzeyê, Lubnan û Sûriyeyê şikestin xwarîye, jiber mudaxeleya leşkerî ya ku ji hêla Emerika û Îsraîlê ve di 28ê Sibatê de dest pê kiriye, rojên xwe yên dawî dijî.

Piştî pêşketinên li herêmê û li Îranê, înîsiyatîfên yekîtîyê yên partîyên Rojhilatê Kurd bi damezrandina Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê, ku ji pênc partîyên Kurdî pêk tê, bi dawî bûn. Ev gavek hêvîdar e hem ji bo Kurdan û hem jî ji bo muxalefeta Îranê.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê, ku ji Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê (PDK-Î), Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK), Partiya Jiyana Kurdistanê (PJAK), Rêxistina Xebatkarên Kurdistanê (XEBAT) û Civaka Zehmetkêşên Kurdistanê (KOMELA) pêk tê, daxuyaniyek hevbeş weşandin û pabendbûna xwe ya ji bo têkoşîna ji bo maf û azadiyên neteweyî yên gelê Kurd ragihandin.

Herwisa diyar kirin ku armanca wan pêkanîna prensîba mafê çarenûsî ji bo gelê Kurd e.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê her wiha bi eşkereyî piştgiriya xwe ji bo pergalek siyasî ya demokratîk, piralî û laîk li Îranê ragihand.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê xwedî kevneşopiyeke têkoşînê ya dirêj û dîrokî ye.

Bi civakê re hevaheng e û ji rewşa gel hayîdar e. Aktorên siyasî yên Kurd di warê armancên siyasî yên ku ji xwe re danîne de profîlek rasteqîn û pêbawer pêşkêş dikin.

Di heman demê de, ew hevsengiya hêzê li herêm û cîhanê bi awayekî rast şîrove dikin. Stratejiyek dişopîninin ku hevpeymaniya bi komên din ên etnîkî û olî yên li Îranê grîng dinirxîne.

**Gelê Rojhilatê Kurdistanê bi tevahî gelek zana û hişyar in, bi rêxistinkirî ne û biryardar in jibo têkoşîna azadiyê. Wan ji bo azadiya xwe bi deh hezaran şehîd dane û berxwedaneke mezin û destanî birêve birine.Herwisa, toreke civaka sivîl a pir xurt û berfireh li Rojhilatê Kurdistanê kar û xebatê dike.**

Aktorên siyasî û tora civaka sivîl li Rojhilatê Kurdistanê, bi karanîna ezmûna xwe ya dîrokî, helwesta xwe ya siyasî ya rastîn û berfireh û têgihîştina rast a cîhanê, baweriyê didin ku ew dikarin bi serkeftî welatê xwe birêve bibin.

Ji aliyekî din ve, Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê divê partiyên din ên siyasî yên li derveyî xwe jî daxilê yekîtîyê bike û bi vê awayî hîn firehtir bibe.

Hilweşandina rejîma zordar a li Îranê û avakirina pergaleke nû, demokratîk û piralî ne tiştek e ku Kurd bi tena serê xwe dikarin pêk bînin.

Jiber vê yekê, avakirina diyalog û hevpeymaniyeke berfireh bi nûnerên siyasî yên gelên Faris, Belûcî, Azerî û Ereb ên li Îranê dijîn re pir girîng e.

Modela herî rastîn a ku dê azadî û derfeta pêşxistina nasnameyên neteweyî pêşkêşî hemû gelên Îranî bike, bê guman pergaleke federal e.

Ya herî girîng, nezelaliyek heye ka piştî hilweşîna rejîma teokratîk dê li Tehranê hikûmetekê çawa bê damezirandin û ji kî pêkbê.

Heta ku Kurd perspektîfa çareseriyeke siyasî di çarçoveya Îranê de biparêzin, pirsa ku li Tehranê bi kê re têkilî daynin dê di rojevê de bimîne.

Cewhera aktorên ku dê di hikûmeta navendî ya Îranê de xwedî gotin bin dê şêwaza rêveberiya pêşerojê ya hem gelê Kurd û hem jî Îranê bi girîngî diyar bike.

Di dawiyê de, plana ku ji hêla Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û hêzên din ên têkildar ve piştî rejîma Îslamî tên pêşbînkirin, eger ne faktora diyarker be jî, gelek muhim e.

Bi hewldanekê dîplomatîk a aktif li qada navneteweyî û danûstandinên prensîbî û biryardar bi Amerîkayê re, hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê dikarin rolek diyarker di pêşeroja Îranê û diyarkirina statuya Rojhilatê Kurdistanê de bilîzin.

Herêma Kurdistanê ya Başûrê Kurdistanê, piştî ku di krîzên dawî yên Sûrîye û Rojava de performansek serketî nîşan da, dikare roleke wisa di derbarê pêşeroja Îran û Rojhilatê Kurdistanê de jî bilîze.

Rojên dijwar û dîrokî li benda gelê Rojhilatê Kurdistanê û bi tevahîya Îranê ne.

Guman tune ku serkeftin dê ya wan kesan be ku ji bo azadî, wekhevî û rûmeta neteweyî têdikoşin.

## Nerîna



**“Miştefa Hicrî”:**

**“Bila hêzên çekdar ên rêjîmê bi lezgînî, Padiganan bi cih bihêlin û vegerne nav malbatên xwe.”**




**“Donald Tiramp”:**

**“Rêberê bê yê Îranê bê erêkirina me nikare nikare berdewam be”**



**“Binyamîn Netanyaho”:**

**“Şer digel rêjîma dije mirov a Îranê renge hinek demdirêjtir bibe.”**



**“Pete Hegseth wezîrê şer ê Amerîka” :**

**“Heta dawîanîn bi rêjîma Îranê berdewam bin, em li kêleka îsraîlê ne”**

# Faşîzma Îranê li dijî hevpeymaniya Kurdistanî ye



**N. Eskender Ceiferî**

Di rojên ku hêrsa raya giştî li seranserê Îranê li ser zext, cudakarî û polîtîkayên navendî zêde dibe, nûçeya avakirina “hevpeymanya hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê” ji hêla şeş hêzên serekeyên Kurdî ve sînorên faşîzma Îranê şikand.

Hevpeymaniya ku endamên wê Partiya Dêmokrata Kurdistana Îranê (PDKÎ), Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK), Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK), Xebat û Komelleya Zehmetkêşên Kurdistanê û Komelleya Şorişgêr in, di daxuyaniya xwe ya fermî de basa pêwîstiya “têkoşînek hevbeş ji bo hilweşandna Komara Îslamî”, “mafê gelê Kurd ku çarenûsa xwe diyar bike”, û “pêşeroja Îranê li ser bingeha dêmokrasî û mafên neteweyan” kir.

Bi dîtina Kurdan, ev hevpeymanî ji peymanek syasî ya tolêransê bêtir e; ew berisvek e ji bo cudakariya bi salan, zexta zimanî û çandî, û hêzên leşkerî û ewlehiyê ku Kurdistan dagir kirine.

Li gor vê hevpeymaniyê, mirov dikare bêje hêzên Kurdî êdî naxwazin bêne piştguhxistin û dixwazin wekî aktorekî biryarder di her pêvajoyeke dêmokratîk a pêşerojê de beşdar bin.

Ev araste di rastî de, berisvek e ji bo siyasetên navendîparêz ku di dîrokê de mafên netewî û herêmî yên Kurdan paşguh kirine.

Berteka komên faşîst ên Îranî li hember vê hevpeymaniyê, cudabûna gotaran nîşan dide ku bi salan e opozîsyon perçe kiriye.

Riza Pehlewî kurê dîktatorê berê û hin kesatiyên din ên dîyasporaya Îranî xwe wek rêber bi nav dikin; lê ezmûnê nîşan daye ku îdiayên wan ku dibêjn ew dixwazin Îranê dêmokratîze bikin, ji amiyê neteweyên nefars yên Îranê ve ciyê bawerkirinê nîn e.

Civaka Kurdî li ser mafê xweyê diyarkirina çarenûsê û daxwazên dêmokratîk rijd e.



Piştî ragihandna hevpeymaniyê, Riza Pehlewî hate deng û got ku divê ertêşa Îranê, sînor û yekparçeyiya Îranê bparêze.

Pehlewî, partiyên Kurdan wek cudaxwaz binav dike û ji xwe diyar e heger desthilata wî hebe, dê wek Xumeynî biryareke din ji bo cîhad li dijî Kurdan bide.

Lewma jî pêwîst e Kurd yekbûna xwe biparêzin û berfirehtir jî bikin.

Bellavbûna nûçeya hevpeymaniya wan şeş partiyan di asta ragihandna cîhanê da nîşan dide ku ev bûyer ji sînorên navçeyê derketiye: dezgehên Radyoya Ewropa Azad, Radyo Lîbêrtî, Rojnama Orşelîm, û The National basa hevgirtina Kurdan li dijî rêjîma Îranî kirin û tekez kirin ku yekbûna hêzên Kurdan dikare hevkêşeyên opozîsyona Îranê biguhere û rêxistin û piştgiriya xwepêşandanên seranserî xurt bike.

Di heman demê de, raportên ku balê dikşînin ser rola wan hizban di oprasyonên çekdarî de û alîkariya xwepêşandanan, hestyariya herêmî û navnetewî ya rewşê zêde kirine.

**Ji bo Kurdan, pirsa sereke ev e: ev hevpeymanî çawa dikare mafên me yên dêmokratîk û çandî bike rastî û rê li ber dupatkirina şerê brakujiyê bigire? Berisva kurt ev e ku rê tenê bi qebûlkirina rengên cuda yên nav civaka Kurdî, tekezkirin li ser çareseriyên bi kom, siyasî û sivîl, û kişandina hevpeymaniyên civakî li seranserê Îranê ye.**

Ezmûna tal nîşan dide ku faşîst û dagîrkeran ne tenê nekarîne û nexwastine civakê azad bikin, lê di heman demê de bûne sedema bêtir zordariya li ser neteweyên mafixwarî.

Ji ber vê yekê, her dewletek bixwaze mafên Kurdan bide, divê di hizra sitratêjiyên nenavendî û herêmîkirina serokatiyê de be.

Di heman demê de, divê em li hember her hewildaneke siyasî ya ku rengê faşîzm û dagîrkariya nû ji hundirê Îranê yan ji derve be, hişyar bin.

Parastina mafên Kurdistanê nayê vê wateyê ku Kurd tevlî projeyên dagîrker bibin; berevajî vê, armanc avakirina Îraneke pêşketî ye ku li ser bingeha wekheviya netewî, mafên çandî, û garantîkirina azadiyên bi kom e.

Herweha her yek ji neteweyên nav Îranê divê bixwe çarenvîsa xwe diyar bikin.

Heger neteweyek dixwaze serxwebûnê ragihîne, divê navend rêgir nebe.

Hevpeymaniya nû ya Kurdan dixwaze rewatya xwe ya exlaqî û siyasî biparêze û dibêje divê ew li ser şefafiyet, hesabpirsîn û pabendbûnek zelal ji bo mafên Kurdan pêdagir be.

# Hevpeyvîna taybet a rojnameya Agirî bi rêzdar Silêman Keleşî çalakvanê siyasî, li ser Hevpeymaniya Siyayî ya 6 Partiyên Kurdî



**Sîmîn Ruhanîzade: Pirsyara 1-Çi zerûretek bû sedema avakirina vê hevpeymaniyê?**

Bersî – Silêman Keleşî - Eşkere ye ku hevpeymanî û hevxebatî ji bo neteweyek wekî Kurdan, ku di bin zilm û dagirkeriyê de dijîn, hem pêwîst û hem jî girîng in. Pêdiviya damezrandina hevpeymaniyeke wiha çend sedem hene.

Ya yekem, di nav gelê Rojhilatê Kurdistanê de xwestekeke xurt ji bo yekîtiyê hebû. Ew ji dabeşbûn û bêaramiya berdewam a di navbera hêzên siyasî û leşkerî yên Kurd de westiyabûn. Daxwazeke zelal ji bo yekrêzî û hevkariyê hebû ji aliyê xelkê Kurdistanê ve.

Ya duyemîn, li Îran û Kurdistanê serhildaneke berfireh li dijî rejîmê çêbû. Komara Îslamî bi hêza zorê bersiv da, bi hezaran kes kuştin û hîn bêtir girtin û birîndar kirin. Ev yek berpirsiyariyeke mezintir da ser milê hêzên siyasî yên li Rojhilatê Kurdistanê ku xwe çêtir rêxistin bikin û bi avahiyeke hevpar bersivê bidin hewcedariyên gel.

Ya sêyemîn, divê damezrandina hevpeymaniyê di bin ronahiya guhertinên bilez ên li herêmê de were dîtin. Rageşiya di navbera Îran û hêzên mezin ên wekî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îsraîlê de ku zêde bibû, û li gef û guvaşan ve bû şer. Di rewşek wisa de, divê her hemû hêzên di hundir û derveyî koalîsyonê de hemû senaryoyên muhtemel binirxînin da ku erkên xwe yên neteweyî bicîh bînin.

Çaremîn, her aktorekî maqûl û siyasîhişmend dizane ku rewşek wisa hevkarî û hevrêziyê hewce dike - ne dabeşbûn û nakokiyên navxweyî. Ji ber vê yekê, damezrandina hevpeymaniyê hem pêwîst bû û hem jî di wextê xwe de bû. Karekî wisa dê erênî bûya bêyî ku kengî hatibe kirin, lê çiqas zûtir, ewqas çêtir.

**2-Me bas ji zerûret û girngiya vê hevpeymaniyê kir, bandora vê lihevkirinê li ser xebat li Rojhelata Kurdistanê dê çawa be?**

Ji roja yekem ve, hevpeymaniyê girîngiyek mezin hebû - hem ji bo gel, hem ji bo hevalan û hem jî ji bo dijberan. Gelê Rojhilatê Kurdistanê û alîgirên wan partiyan, nûçeya wê hevgirtinê bi kêfxweşî û hêviyê pêşwazî kirin, lê dijberan bi nerehetî û fikar bertek nîşan dan. Ne tenê li herêmê bertek hatin nîşan dan, lê di medyaya herêmî û navneteweyî de jî hatin ragihandin. Hevpeymanî dikare xebata siyasî bigihîne astek nû û bibe alîkar ku yekîtiya siyasî, dîplomatîk û rêxistinî xurt bibe. Ev dikare hewldanên hem li hundir û hem jî li derveyî welêt bibandortir û armancdartir bike.
Di heman demê de, ev hemû bandorên erênî bi hevkariya di navbera aliyên hevpeymaniyê de ve girêdayî ne. Yekîtî û hevrêzî çiqas xurttir be, bandora erênî ewqas mezintir û mayîndetir dibe.
Bê guman, ev hevpeymanî dê bandorek xurt û erênî li ser xebata li Rojhilatê Kurdistanê bike.

**3-Ev hevpeymaniye di rewşa niha de bi taybetî ev rewşa ku rejîma Îranê di nav deye helgirê çi peyamek sitiratîjî ye?**

Bi raya min, hevpeymanî peyamek zelal a berpirsiyarî û xemxwariya wan partiyan hember neteweya me dide eyankirin.
Ew nîşan dide ku hêzên têkildar berjewendiyên gel û neteweyê li ser cudahîyên xwe yên siyasî û îdeolojîk didanên. Her çend rêber bername û perspektîfên wan cuda bin jî, ew li dora armancên hevpar ên stratejîk û neteweyî bûne yek.
Ev nîşan dide ku pirsgirêkên neteweyî cehd bo çareserkirina wan ji nakokiyên navxweyî girîngtir in. Di demeke aloz, tijî krîz û nezelaliyê de, ev peyamek girîng e - hem ji bo gel û hem jî ji bo cîhana derve.

**4-Hevpeymaniya 6 aliyên siyasî yên Kurdistanê dikare pirisa Kurd li civaka navnetewî bike pirsek girîng û bikeve nava Hevkêşeyan de?**

Belê. ew rewşa îro heyî, pirsa Kurd bi gelemperî ketiye qonaxek nû û bala navneteweyî zêdetir kişandiye.

Nimûneyek zelal rewşa li Rojava ye. Li wir, Kurdan bi piranî karîne bi hev re tevbigerin û bi yek dengî biaxivin. Bi




hewildanên siyasî û dîplomatîk, wan piştgirî ji hikûmet, parlamento û civaka sivîl li Ewropa û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi destve anîn da ku pêşî li qirkirina kurdan û binpêkirina mafên wan li Rojavayê welat bigirin. Ev yek jî bû sedem ku rêzdar Mazlum Ebdî wekî nûnerê Kurdên Rojava beşdarî konferansa ewlehiyê ya navneteweyî ya li Munchenê bibe, digel nûnerên dewleta Sûriyeyê.
Ev nîşan dide ku dema aktorên Kurd bi hev re û bi stratejîk tevbigerin, ew dikarin doza xwe bigihînin astek navneteweyî.

Rewşa li Rojhilatê Kurdistanê cuda ye, lê di heman demê de derfet jî hene. Hêzên siyasî yên li wir li dijî rejîma Îranê ne - rejîmek ku têkiliyên wê bi gelek welatên bi bandor re aloz bûne û pir caran ji ber binpêkirina normên navneteweyî û mafên mirovan tê rexnekirin û îro rojê rastî hêrişan bûye û gelek rêberên wê yê siyasî û leşkerî hatine kuştin, Di çarçoveyek wisa de, hevpeymaniyek yekgirtî dikare bi navneteweyîkirina pirsgirêka Kurd li rojhilat hêsantir bike û wê bi zelalîtir bixe rojeva cîhanî.

Ewê yekê îro em dibînin ku ew peyvendî û piştgiriya welatan li wan hêzên Rojhilatê welat, govannameya wê hevgirtinê e ku ew kirine rastî.

**5-Bertekên zêde me ji dost û dijminan dîtin, ev bertekên cuda derxerê çi ye?**

Bertekên li hember avakirina hevpeymaniyê li Rojhilatê Kurdistanê xurt û bi zelalî hatin nîşan dan û heta bala welatên zilhêz jî kişande ser wan û pirsa kurd.

Di nav dost û alîgiran de, bertek bi kêfxweşî û hêviyê bi taybetî bûn. Ji bo gelek Kurdan, hevpeymanî gavek girîng ber bi yekîtî, hevrêzî û têkoşîna hevpar a ji bo mafan temsîl dike. Armanca yekbûna Kurdan - ku hêzên siyasî divê bi hev re bisekinin û bi hev re bi pirsgirêkan re rû bi rû bimînin - demek dirêj e ku xwestekek senteral ya gel e.

Ji aliyekî din ve, berteka dijberan jî ciyê famkirinê û lêhûrbûnê ye. Di dîrokê de, dijberên Kurd gelek caran eleqeya wan bi parçebûn û nakokiyên navxweyî yên di navbera aktorên Kurd de hebûye. Eniyek siyasî ya yekgirtî û yekrêzkirî fersendê nade dijmin bo çêkirina nakokiyan. Dema ku partî û tevgerên Kurd bi hev re tevdigerin, ew di nav kesên ku perçebûnê dixwazin de fikar û bêhntengiyê çêdike.

Di seranserê dîrokê de, nakokiyên li ser bingeha ol, eşîr û cûdahiyên siyasî pir caran ji hêla aktorên derveyî ve hatine zêdekirin da ku yekîtiya Kurdan qels bikin. Ji ber vê yekê, yekîtiyek rastîn dikare ji bo kesên ku li dijî daxwazên Kurdan in wekî dijwariyek stratejîk were dîtin.

Di encamê de, eşkere ye ku hem kêfxweşiya gel û hem jî fikara dijmninan, heman rastiyê derdikevin: Yekîtî girîng e. Ji bo gelek kesan, ev tifaq hêviyek ji bo hêz, hevrêzî û pêşkeftina pêşerojê temsîl dike.

**Gelek spas bo birêz Silêman Keleşî**

# Têhran Di Bin Kavilan De



N. Dr. Mecîd Heqî

Dîrok carinan bi gavên hêdî dimeşe, lê carinan jî di nav çend mehan de wekî tsunamiyekê hemû tiştî radimalîne. Ew tiştê ku di navbera Kanûna 2025 û Sibata 2026an de li ser axa Îranê qewimî, ne tenê “guhertina rejîmê” bû; ew herifîna felsefeya dewlet-neteweya navendparêz û teokratîk bû ku nêzîkî sedsalê ye (ji dema Pehlewiyan heta mîrateya Xumeynî) gelên vê cografyayê di bin tirs û zextê de girtibûn.

Îro ku em li kavilên Tehranê û valahiya desthilatê dinêrin, pirs ne tenê ew e “Kê kûştiye?”, pirs ew e “Em ê çi ava bikin?”. Ji bo miletê Kurd li Rojhilat, ev saet, saeta herî krîtîk a dîrokê ye.

**Beşa 1: Teqîna Aborî û Herifîna Peymana Civakî**

Her tişt ji “Bazar”ê dest pê kir. Di aboriya siyasî ya Îranê de, Bazar ne tenê cihê kirîn û firotinê ye, belkî dilê îstîkrara siyasî ye. Dema ku di Kanûna 2025an de nirxê tûmen li hember dolar gihîşt asteke ku êdî dikanan nediwêrî deriyên xwe vekin, peymana civakî ya dawî şikiya.

Rêjîma Komara Îslamî bi salan bi navê “Aboriya Berxwedanê” (Eqtesad-e Moqawematî) xelk birçî hişt da ku fîloya xwe ya moşekî û projeya atomî mezin bike. Lê dema ku nan bû xewneke giran, “Bazar”ê dît ku berjewendiyên wê ne di nav îdeolojiya خامنه‌ای (Xameneyî) de ne, belkî di normalîzebûna bi cîhanê re ne. Ev teqîna aborî bû sedem ku çîna navîn a bajarî bi çîna hejar re bibe yek.

**Beşa 2: Januara Bixwîn; Jenosîda li Ber Çavên Cîhanê**

Dema ku di 8ê Kanûna Paşîn a 2026an de (January 8) mangirtina giştî li Kurdistanê dest pê kir û zû li Tehran, Tebrîz û Ahwazê belav bû, rejîmê rûyê xwe yê herî hov nîşan da. Di nav du rojan de (8 û 9ê Kanûnê), zêdetirî 40,000 mirov hatin qetilkirin. Ev ne tenê serkutkirinek bû, ev jenosîdeke stratejîk bû.

Lê hesabê Tehranê xelet derket. Di sedsala 21an de, xwîn êdî tirsê naxfirîne, hêrsê diafirîne. Tawanbarkirina xwepêşanderan wekî “sîxurên Îsraîlê” êdî li bazarê nediçû. Rejîmê bi vê komkujiyê rewayiya xwe ya exlakî li asta navneteweyî bi temamî winda kir. Ji bo Kurdan, ev qonax bû xala “vegera bêveger”. Kurdistan êdî ne tenê daxwaza mafên çandî dikir, belkî daxwaza “parastina jiyanê” dikir, ku ew jî tenê bi desthilatdariya neteweyî pêkan bû.

**Beşa 3: Şerê 12 Rojan û Hilweşîna “Kela Atomî”**

Berî ku mûşekên yekem di Sibata 2026an de li baregeha Xameneyî bikevin, di Hezîrana 2025an de “Şerê 12 Rojan” derbeke giran li binesaziya leşkerî ya Îranê dabû. Îranê bi salan bi blufa atomî cîhan rehîn girtibû. Lê dema ku îradeya navneteweyî (bi pêşengiya Amerîka û Îsraîlê) biryar da ku “blufa atomî” bi dawî bike, derket holê ku kela pasdaran ji heriyê hatiye çêkirin.

Di vî şerî de, derket holê ku moşekên dûravêj ên Îranê ne tenê ji bo Tel Avivê, belkî ji bo Parîs û herêmên din ên Ewropayê jî gef in. Vê yekê kir ku hevkariya navneteweyî li dijî Tehranê bibe hevkariyeke stratejîk û hebûnî. Dema ku Abbas Iraqçî li ser maseya danûstandinan hewl dida “demê bikuje”, êdî dem ji bo wan qediya bû.

**Beşa 4: Saeta Sifrê; Mirina Teokratan**

28ê Sibata 2026an (February 28) dê di dîrokê de wekî “Saeta Sifrê” were naskirin. Kuştina Elî Xameneyî û 40 serkirdeyên payebilind ên pasdaran û dewletê di yek êrişê de, hiyerarşiya ku 47 salan Îran bi rê ve dibir, di nav saetekê de hilweşand.

Mirina Xameneyî ne tenê mirina kesekî bû, mirina “stûna fiqîhî” ya rejîmê bû. Valahiya desthilatê ya ku çêbû, Îran xiste nav qonaxeke nû ya jeopolîtîk. Li aliyekî tirs û xofa alîgirên rejîmê, li aliyê din şahiya gelên bindest. Lê di nav vê şahiyê de, metirsiyeke mezin heye: Gelo dê kî vê valahiyê tije bike?

**Beşa 5: Stratejiya Neteweyî ya Kurdistanê (Nexşerêya 2026)**

Di vê valahiya desthilatê de, Kurdistan xwedî avantajeke mezin e: Rêxistinbûn. Berevajî opozîsyona navendî ya fars ku parçe parçe ye, Kurd li Rojhilat xwedî partiyên bi ezmûn û hêza Pêşmerge ne. Ji bo ku Kurdistan nebe qurbaniya “lîstikên nû yên Tehranê”, divê ev stratejî were meşandin:



**1. Pêşmerge wekî Artêşa Parastina Neteweyî**

Êdî dema şerê gerîla yê li çiyan bi dawî bûye. Pêşmerge divê dakeve bajaran û sînorên Rojhilatê Kurdistanê biparêze. Parastina binesaziya aborî (wekî bendav, kanên madenê û sînorên bazirganiyê) mifteya serweriya neteweyî ye. Divê ti hêzeke biyanî (çi ji bermayiyên pasdaran, çi ji hêzên navendî yên nû) destûr neyê dayîn ku bikeve axa Kurdistanê.

**2. Sîstema Rêveberiya Xweser a Civakî**

Divê meclîsên gel li her bajarî werin avakirin. Ezmûna “Jin, Jiyan, Azadî” nîşan da ku civaka Kurdistanê amade ye ji bo birêvebirina xwe. Divê valahiya îdarî bi saziyên sivîl û neteweyî were tije kirin da ku pêşî li hercûmercê (chaos) were girtin.

**Beşa 6: Metirsiya “Faşîzma Nû”; Ji Mîzerê ber bi Tacê**

Yek ji metirsiyên herî mezin ji bo Kurdan, derketina nasyonalîzma tundrew a fars e ku di bin navê “yekpareyiya xakê” de dixwaze dîtina Pehlewiyan zindî bike. Reza Pehlewi û alîgirên wî hewl didin valahiya Komara Îslamî bi “Dîktatoriya Tacê” tije bikin.

Ji bo Kurdan, ferq di navbera “Şêx” û “Şah” de nîne heger her du mafê diyarkirina çarenivîsê (Right to Self-Determination) nas nekin. Stratejiya Kurd divê li ser vê yekê zelal be: Em ê careke din nebin qurbaniya navendparêziyê. Her sîstemek ku li Tehranê ava bibe, divê li ser bingeha Konfederalîzmê yan Federalîzma Neteweyî-Cografî be. Heger na, serxwebûna tam mafê rewa yê miletê Kurd e.

**Beşa 7: Dîplomasiya Serbixwe û Hevpeymaniyên Nû**

Kurdistan divê ji bin siya “dîplomasiya Tehranê” derkeve. Divê “Encumena Dîplomasiya Rojhilat” bi fermî bi Amerîka, Ewropa û welatên herêmê re bikeve danûstandinan. Peyama me ji bo cîhanê ev e: “Kurdistana azad, garantîya îstîkrara Rojhilata Navîn e.” Em dikarin bibin sînorê herî saxlem li dijî belavbûna tundrewiya olî û terorîzmê. Her wiha, hevkariya bi gelên din ên bindest re (wekî Belûç, Ahwazî û Azeriyên demokrat) dikare bibe blokekî bi hêz li dijî her hewldaneke nû ya dîktatoriyê li Tehranê.

**Beşa 8: “Jin, Jiyan, Azadî” wekî Destûra Bingehîn**

Şoreşa ku ji Seqizê dest pê kir, îro bûye mîrateya gerdûnî ya Kurdan. Di Kurdistana 2026an de, mafên jinan û azadiyên medenî ne tenê “şiar” in, belkî bingeha dewletbûna me ne. Ev felsefe nîşan dide ku civaka Kurd ji aliyê modernîteyê ve ji navenda Îranê pêşketîtir e. Parastina vê rûyê demokratîk, dê piştgiriya civaka navneteweyî ji bo statuya Kurdistanê misoger bike.

**Encam: Vegera Bo Malê**

Dîroka Îranê ya sedsala borî, dîroka “talankirina nasnameyê” bû. Tehran wekî deryayeke reş hemû rengên din daqurtandin. Lê îro ew derya ziwa bûye. Kavilên Tehranê nîşan didin ku ti sîstemek bi zora çek û îdamê nikare heta hetayê bimîne.

Miletê Kurd li Rojhilat, îro ji her demê zêdetir nêzîkî azadiyê ye. Lê azadî ne tenê “nebûna dijmin” e, belkî “hebûna îradeyê” ye. Divê em bi aqilmendî, yekîtî û stratejiyeke neteweyî, ber bi “Xana Pederî” (Serweriya Neteweyî) ve gav bavêjin.

Tehran ber bi çarenivîsa xwe ya hilweşînê ve diçe, lê Kurdistan ber bi ronesansa xwe ve dimeşe. Ev sedsal, sedsala miletên bindest e ku ji nû ve nexşeya dilê xwe xêz dikin.

Bijî Kurdistan, Bijî Azadî.

# Peyama Komîteya Navendî ya Firqeya Demokratîk a Azerbaycanê bi boneya avakirina hevpeymaniya partiyên Kurdistana Îranê




Ragihandina hebûna hevpeymaniya 6 partiyan li Kurdistana Îranê di 3'ê Reşemeha, 1404an a Rojî de weke yek ji pêşketinên girîng di atmosfera siyasî ya hêzên ku li dijî zordariyê li Îranê ne tê hesibandin. Ev hevgirtina di navbera çend tevgerên siyasî yên bi paşxane û nêrînên cûda - di nav de Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, Partiya Azadiya Kurdistanê, Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê, Rêxistina Xebatê û Partiya Komeleya Zehmetkêşana Kurdistanê - hewldanek temsîl dike ji bo derbaskirina parçebûnê û ber bi hevkariya siyasî ve di parastina mafên demokratîk ên gelê Kurdistanê û hemî gelên Îranê de.

Di rewşekê de ku hêzên siyasî yên welêt bi salan e bi parçebûn û dijberîkirin re rû bi rû ne, avakirina hevpeymaniyek wusa nîşan dide ku hewcedariya hevgirtinê ji bo bidestxistina azadî, edaleta civakî û demokrasiyê ji her demê bêtir tê hîskirin. Ezmûna dîrokî jî nîşan daye ku bêyî hevkarî û yekîtiya hêzên pêşverû û demokratîk, veguhestina ji zordariyê û avakirina pergalek populer li Îranê dê dijwar be.

Pirsa neteweyî li Îranê rastiyek dîrokî û civakî ye ku ne tenê bi polîtîkayên navendî yên hikûmetên otorîter - hem di serdema Pehlewî û hem jî di dema Komara Îslamî de - nehatiye çareser kirin, lê di heman demê de bi tepeserkirin û înkarkirina nasnameyên neteweyî jî bêtir tevlihev bûye. Di şert û mercên weha de, bilindkirina daxwazên neteweyî û demokratîk ji hêla hêzên siyasî yên Kurdistanê ve beşek ji têkoşînek berfirehtir ji bo azadî û wekheviyê li seranserê Îranê ye.

Lêbelê, pêkanîna van daxwazan tenê di çarçoveya parastina yekparçeyiya axa Îranê û avakirina pergalek demokratîk de mimkun e; pergalek ku tê de mafên hemî netewe, ziman, çand û olên welêt têne nas kirin û avahiya desthilatdariyê li ser bingeha beşdariya wekhev û demokratîk tê organîze kirin.

Her wiha divê neyê jibîrkirin ku mirovên ji her du aliyên çîrokê her gav hewl didin ku rêya van nêzîkbûnan asteng bikin û tovên dabeşbûnê di navbera gelên Îranê de biçînin bi afrandinağ pirsgirêkên derewîn û gurkirina têgihîştinên nerast. Ev hewldanên serhildanî - carinan bi zanebûn û carinan ji ber nezanînê - nikarin rastiya dîrokî ya têkiliyên di navbera neteweyan de biguherînin. Dostanî û jiyana hevbeş a gelên Azerbaycan û Kurdistanê di dîroka têkoşînên azadiyê yên Îranê de xwedî rehên kûr in, û ev girêdana dîrokî dê ji ber provokasyonên weha zirarê nebîne.

Ezmûna dîrokî ya hevkarî û yekîtiya di navbera Partiya Demokrat a Azerbaycanê û Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de di dehsalên borî de mînakek girîng a hevgirtina hêzên neteweyî û demokratîk li Îranê ye. Vê hevkariyê nîşan da ku têkoşînên neteweyên cûda yên Îranê ji bo mafên neteweyî, edaleta civakî û demokrasiyê ne di dijberiya hev de, lê di yekîtî û hevgirtinê de wateyê dibînin.

Partiya Demokrat a Azerbaycanê her gav tekez li ser prensîba ku pêşeroja Îranê tenê bi yekîtî û hevpeymaniya hêzên siyasî yên gelên Îranê û li ser bingeha wekheviya qanûnî, demokrasî û edaleta civakî dikare were pêkanîn kiriye. Yekîtiya dilxwaz û hişmend a neteweyan di çarçoveya welatekî hevpar de dikare rê li ber avakirina rêjîmek demokratîk û domdar li Îranê veke.

Ji vê perspektîfê ve, hevpeymaniya şeş partiyan li Kurdistana Îranê dikare wekî gavek erênî ber bi xurtkirina hevgirtina hêzên neteweyî û demokratîk ve were hesibandin; gavek ku, eger bi hevkariyeke berfirehtir di navbera partî, rêxistinên siyasî û hêzên pêşverû yên li seranserê welêt de were kirin, dikare bibe alîkar ku eniyeke berfireh ji bo azadî, demokrasî, edaleta civakî û parastina yekparçeyiya Îranê were avakirin.

**Komîteya Navendî ya Firqeya Demokratîk a Azerbaycanê**

# Daxuyaniya Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 8ê Mars



**Xebatkarên doza Azadiyê!**
**Jinên hişar û pêşengên Kurdistanê!**

Îsal li demekê de em yada 8ê Marsê bi bilind radigrin ku rêjîma dijejin a komara îslamî li encama siyasetên xwe yên çewtên navxwyî û derve de Îran rakîşandiye bo nav şerekî malwêranker ku bêguman encama vê, dê bi nemana vê bi xwe bi dawî bê. Dîroka xebat û tekoşîna jinan li serhildana sala 1857 a Zayînî li "New York"ê ve heta rawestan li hember siyaseta qirêj a "hicaba bi zorê" û pêşengatiya jinan li tevgera "Jin Jiyan Azadî"yê de hilgirê vê rastiyê ye ku ti hêzeke xwesepên nikare rê ji îradeya jinan bo rizgarî û mafên wan bigre.

8ê Mars hilkeftek bo bilindragirtina destkevtan û hevdem bîranîna wan sitem û cudatîdanînên sîstematîk e ku li Îrana jêr desthilata komara îslamî de bûye rewşeke berdewam. Bêguman tevgera mafxwazaneya Jinan bi taybet li Kurdistanê, aliyeke din a qonaxeke nû bûye; Niha ev tevgera xwediyê sermayeyek civakî ya bi nirx e ku wek qateke yekalîker a siyasî, bi dijî hizra dijejiniya vê rêjîmê disekine û tevgera "Jîna"yê jî li pêşîneya xwe de heye. ev meydandarî bi tenê durûşm nîne, belku têkşikandina praktîkî ya vê sîstema tepeserker e ku 47 sal in mafên netewî û mirovî zewt û binpê kirine.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ku her li serdema Komara Kurdistanê û li ser destê Pêşewa "Qazî Mihemmed", kevirê xîmê vê xebata rêkxistinî a jinan li jêr alaya "Yekîtiya Jinan" de danî, rizgariya niştiman, mafê netewî û azadiya jinan, bi stratêjiyeke bihevgirêdayê zaniye. Li bernameya Hizba me de mafê vekhev a jin û mêran, xalek bingehîn û neguher e û wek prensîpeke dêmokratîk û cîhanî, bawerî pê heye.

Li wir daxwaz ji hemû çîn û qatên Kurdistanê, bi taybet jinên hişyar û azadîxwaz dikin ku li vê qonaxa hestiyar de ku rêjîm dixwaze bo şerxwaziyê hevrikiyan bo derveyî sînoran veguhaze, bi rêkxistinkirina medenî û bihêzkirina navendên xebata siyasî li navxwe de, xwe bo guherînên kûr amade bikin. Bi raya me li Kurdistanê, erkê hemû kesên vekhevîxwaz e ku xebat bo mafên jinan wek parekî neveqetiyayî ji xebata netewî û dijî sitemkarî bibîne û beşdariyeke çalakane li herifandina yêkcariye vê rêjîmê de bike.

Destyeta Kargêrî ya Hizbê tevî pîrozbahîkirina 8ê Marsê, tekez dike ku heta rêjîma komara îslamî bimîne, nirxên "Jin", "Jiyan", "Azadî", bidestve nayên. Bila 8ê Mars bibe hêvinê yekgirtina hemû azadîxwazan bo dawîanîn bi vê rêjîma dije jin û çewsîner.

**Serkeve xebata berheqe jinan bo bidestveanîna maf û azadiyên wan.**

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**8ê Şibatê**

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Bûyerên gelek bi sam li girtîgehên rêjîmê de diqewimin



Karnasên mafên mirovî yên Saziya Netewên Yekgirtî huşdarî dane ku bûyerên gelek bi sam li girtîgehên rêjîma Îranê de diqewimin û rêjîma Îranê bi rêjeyeke nexuya û bi nihênî girtiyan bidar diveke û bi dizî ve teremên wan binax dike.
Wan karnasên Saziya Netewên Yekgirtî bi belavkirina daxuyaniyekê îşare bi cudatiya amarên rêjîmê û amarên tomarkirî kirine û ragihandine ku amara serast a vê tundûtîjiya rêjîma li hember neraziyan bi ti awayek nayê zanîn.
Wan karnasan daxwaz ji rêjîma Îranê kirine ku bi lezgînî rohnkirinên hewce û zanyariyên li derheq kesên bêserûşûnkirî, bidarvekirî û cihê biaxspartina kesên ku kuştine an li girtîgehan de bidar vekirine, bi lezgînî belav bike.
Piraniya wan şehîdan an li jêr îşkenceyên gelek hovane de têne şehîd kirin û yên têne bidarvekirinê jî, şûnwarên îşkencekirinên hovane bi ser laşê piraniya wan têne xuya.

## UNICEF li derheq zarok û xwendevanên binçavkirî daxuyaniyek belav kir




Piştî derbasbûna zêdetir ji 40 roj ji komkujiya xwenîşanderên aşîtîxwaz li şeqamên Rojhilatê Kurdistan û Îranê û berdewamiya binçavkirinên hovane a jin, zarok, ciwan û bi temenan li seranserê Rojhilatê Kurdistan û Îranê "UNICEF"ê bertek ji xwe nîşan da û daxuyaniyek belav kir.
"Edward Bîgbêdir", birêveberê deverî yê "UNICEF"ê bo Rojhilata Navîn û Bakûrê Afrîqayê bi belavkirina daxuyaniyekê, daxwaza azadkirina lezgîn a zarokên binçavkirî û daxwaza destpêregihjîştina lezgîn bi wan kir.
Herwisa navbirî tekez kir ku zarok, wek kesên mezin nînin û hewcehî bi pêregihîştina taybet hene, standina azadiyê ji wan dikare bandora hertimî li ser geşeya zarokan hebe û UNICEF daxwaza dawîanîn bi binçavkirina zarokan kir, û daxwaza azadkirina lezgîn a wan zarokan kir ku li xwenîşandanên vê dawiyê li Îranê de hatine binçavkirin.

## Karnasên mafên mirovî ya Saziya Netewên Yekgirtî daxwaza rohnkirin li rêjîma Îranê kirin



Karnasên mafên mirovî ya Saziya Netewên Yekgirtî daxwaz ji rêjîma îslamiya Îranê kirin ku li derheq qeder û cihê ragirtina girtiyên ku li heyva Befranbarê hatine binçavkirin an hatine bêserûşûnkirin, bi awayekî rohn rabigehîne û tevaviya sizayên sepandî yên bidarvekirinê û birêvebirina sizayên sepandî yên pêwendîdar bi nerizaytiyan bisekinîne.
May Sato, Nûnera Taybet a Saziya Netewên Yekgirtî li Karûbarên Mafên Mirovî ya Îranê jî hevdem li tora civakiya "X" de belav kir: "piraniya kesên ku li nerizayetiyan de hatine kuştin a girtinê, xelkê asayî yên medenî ne ên wek zarokan û kesên ser bi etnîk û olên cuda cuda nav de hene.
May Sato ev yeka jî ragihand ku li nav wan kuştî û birîndaran de parêzerên ku dixwestin ji neraziyan berevaniyê bikin, kadrên dermanî ku birînên birîndaran derman kirine, rojnamevan, nivîskar, hunermend û parêzerên mafên mirovî jî hene.
Herwisa navbirî ragihandiye ku piştî derbasbûna zêdetir ji 40 roj ji tepeserkirina bi xwîn a nerizayetiyên heyva Befranbarê, hêj hêzên ewlehî li şeqaman de mane û mobaylên xelkê vedikolin.

# Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (513)

